# Daxwaza sûdên perwerdehî û beşdariyê

**Ji kerema xwe vê forma daxwazê (ji bilî xaneyên diyarkirî bi rengê gewr) bi tîpên mezin û veqetandî tijî bike. Ji kerema xwe bala xwe bide ser "Xalên têkildarî forma daxwaza sûdên Perwerdehî û Beşdariyê".**

Navçeya Hameln-Pyrmont
Rêveberiya karên civakî / Koma alîkariyên civakî
Süntelstraße 9
31785 Hameln

| | |
|---|---|
| **Daxwazker**<br>Paşnav û navê dayîk an bav | |
| **Navnîşan**<br>Mekan, Kolan û Plaka Malê: | |
| **Hejmara telefonê jibo pirsên ihtimalî yên zêdetir** | |
| **Têkiliya Bankî** | IBAN |
| | |
| | Enistîtûya Kiredît: |
| | Xwediyê hesabê: |
| **Navê zarokê ku jibo wî/wê daxwaza sûd û ser-pişkiyan tê kirin**<br>(Ji kerema xwe jibo hr zarokekî daxwazeke taybet raber bike) | |
| **Roja Jidayîkbûnê** | |
| **Baxçeya Zarokan / Dibistan**<br>Navê Baxçeya Zarokan an dibistana ku zarok diçe wir, pêkhatî ji pol/payeya perwerdehiyê/Kursa fêrkirinê<br>**Her cûre guhertin divê bilez were ragihandin!** | |
| Wergirên meaşa Betaliyê (Arbeitslosengeld) û alîkariya mesrefa rihetiya civakî (Sozialgeld) li gorî cilda duyem ji Qanûna Dabînkirina Civakî (SGB II) ji kerema xwe bila formeke cuda ya daxwazê bo Navenda Kar a "Hameln-Pyrmont" raber bikin | ☐ **Alîkarî jibo dabînkirina debara jiyanê / der-hata bingeh**<br>☐ **Alîkariyên dewletê li gorî Qanûna alîkariyên (subside) Penaberan**<br>☐ **Sûdên zarok (Kindergeld) û Alîkariya mes-refa Malê (Wohngeld)**<br>(Ji kerema xwe daxwazan pêve bike)<br>☐ **Sûdên zarok (Kindergeld) û Alîkariya mes-refa Malê (Wohngeld)**<br>(Ji kerema xwe daxwazan pêve bike) |

## Ez ji roja __________ sûdên jêrê daxwaz dikim:

| | Belgeyên pêwîst: |
|---|---|
| ☐ **Navroja hevpar li**<br>☐ Dibistan ☐ Navenda Lêmiqatebûna Rojane ji Zarokan (KiTa) ☐ Navenda Ragirtina rojane ya Zarokan<br><br>**Amadebûn bi vî awayî ye:**<br><br>☐ **Rojane**<br>☐ **Bi awayê navgînî ____ di hefteyê da** | • Guwahiya perestarê zarok derbarê navnivîsandina jibo navrojê. |
| ☐ **Beşdarî di gerreke yekrojî da**<br><br>**Di tarîxa jêrê:** ____________________________<br><br>**Mesrefên ihtimalî** ____________________ **Euro (€)**<br><br>**Li gorî**_________________________ | • Guwahî / Nameya Ragihandina dibistanê an Navenda Lêmiqatebûna Rojane ji Zarokan (KiTa) derbarê:<br>Roj, Mekan, Mesref, Têkiliya bankî ya Dibistanê / Navenda Lêmiqatebûna Rojane ji Zarokan (KiTa) û belgeya raberkirinê<br>• Selimandina dayînê bi rêya rêzikhesaba bankî an Ffîşa dibistanê / Navenda Lêmiqatebûna Rojane ji Zarokan (KiTa) (Heke pêştir hatiye raberkirin) |
| ☐ **Beşdarî di gerreke çendrojî ya Polê**<br><br>**Heyam (Ji /Heta):** _________________________________<br><br>**Mesrefên ihtimalî** _________________________**Euro (€)**<br><br>**Li gorî** ___________________________________ | • Guwahî / Nameya Ragihandina dibistanê derbarê: Roj, Mekan, Mesref, Têkiliya bankî ya Dibistanê û belgeya raberkirinê<br>• Selimandina dayînê bi rêya rêzikhesaba bankî an Ffîş (Heke pêştir hatiye raberkirin) |
| ☐ **Piştgiriya hînbûnê**<br>☐ **Ez sûdên Rêveberiya Xortan Jibo piştgiriya Hînbûnê wernagirim!**<br><br>- **Cûreya piştgiriya daxwazkirî:** ____________________________<br><br>- **Piştgirî bi rêya çi kesan pêk tê?:** _______________<br><br>_____________________________________________<br><br>- **Mefref bi qasî jêr e:** _____________________________ **Euro (€)** | • Forma zêdekirî ta tijîkirî û morkirî ji aliyê dibistanê va |
| ☐ **Beşdarî di jiyana civakî û çandî (Heta dawiya 18 saletiyê)**<br><br>- **Jibo çalakiya jêrê:** __________________________<br><br>- **Mesrefên mehane bi vî qasî ne: Euro (€)** | • Guwahiya morkirî ya civat an Enbistîtûya civakî an çandî derbarê heqê endamêtiyê yê dayî an pereyê ku divê |
| ☐ **Veguhestina xwendekaran ji pola yazdehem û zêdetir**<br><br>- **Ji:** ________________________________________<br><br>- **Bo cihê dibistanê:** ___________________________<br><br>- **Bi amûrê veguhestinê yê jêrê:**<br>☐ **Utubûs** ☐ **Tren**<br>- **Mesrefên mehane bi vî qasî ne:** ______________________ **Euro (€)** | • Guwahiya dibistanê derbarê amadebûna rêkûpêk li dibistanê<br>• Belge derbarê pereyên ku divê bên dayîn an hatine dayîn (bilêt) û bilêta wesayîtên veguhestinê yên gelemperî pêkhatî ji hejmara miştêrî<br>• Têbînî: Tenê mesrefên jibo wesayîta veguehstinê yê |

| | |
|---|---|
| | erzan tê qebûlkirin |
| ☐ **Pakêta bingeh a dibistanê: Tebax 20___**<br>**Sibat 20______** | |

<table>
<tr><td colspan="4">- Ez rastbûna lêzanînên jorê piştrast dikim.<br>- Ez dipejirînim ku kopiya kopon / lêzanînnê qebûlkirina mesrefan rasterast bo raberkera sûd û xizmetan were şandin (heke naxwazî, ji kerema xwe ser wê xêzê bikişîne!).</td></tr>
<tr><td>Mekan / Roj</td><td>Wajoya daxwazkerê (Jin) / Daxwazkerî (Mêr)</td><td>Mekan / Roj</td><td>Wajoya nûnerê qanûnî yê daxwazkerên bin temenê qanûnî</td></tr>
<tr><td></td><td></td><td></td><td></td></tr>
</table>

**<u>Têbîniya têkildarî pêwîstiya bo hevkarîkirinê:</u>**

**Tu erkdarî guhertinên rewşa xwe ya kesane bilez ji vir ragihînî! Ev yek nemaze demekê pêwîst e ku êdî sûdên daxwazkirî yên li vir neyên bikaranîn an sûdên bingeh (alîkariya jibo dabînkirina debara jiyanê / alîkariya mesrefa malê/sûdên temamkirî yên zarok / alîkariyên dewletê (subside) li gorî Qanûna Alîkariya Penaberan) êdî neyê raberkirin.**

# <u>Têbîniyên girîng</u>

**Sûd di derfeta yekem da ji destpêka meha ku têda daxwaz tê raberkirin, tê dayîn.**

Sûdên **beşdariya di jiyana civakî û çandî** dikare jibo zarok û nûciwanên ku hîn negihîştine temenê qanûnî were daxwazkirin (bin temenê 18 salî).
**Sûdên din** dikarin heta dawiya 25 saletiyê, di rewşa çûyîna zarok bo Navendeke lêmiqatebûna ji zarokan an Dibistana Perwerdehiya giştî an Pîşeyî û Teknîkî werin daxwazkirin.

Ji kerema xwe ragihîne ku sûd jibo kîjan zarok, nûciwan an mezinê xort tên daxwazkirin. Bi vê daxwazê dikare çend sûd bên daxwazkirinê. Ji kerema xwe baldar be: Jibo her zarok an nûciwan an mezinê xort divê daxwazeke taybet were raberkirin. Ji 15 saletiyê û pêva divê guwahiya nû ya Perwerdehiyê were raberkirin.

**• Navroja hevpar li dibistan / Navneda lêmiqatebûna rojane ji zarokan / Navenda ragirtina rojane ya zarokan**
Ji kerema xwe bi danîna elameta (X) hejmara carên amadebûna di bernameya navroja hevpar piştrast bike. Ev lêzanîn bi mebesta îmkana hesabkirina daxwazê pêwîst in.
**• Gerr û seferên çendrojî yên pola dibistanê / Navenda lêmiqatebûna rojane ji zarokan**
Pereyê nav berîkê an mesrefên ku pêştir pêk tên (wek mînak solên sporê, kincên avjenîkirinê). Wek mesref nayên hesab. **Ev sûd bi awayê rêkûpêk di qaliba koponê tên raberkirin an bi awayê rasterast digel dibistanê tên safîkirin.**

**Piştgiriya hînbûna guncan a perwerdehiyê**
Bêyî piştrastkirina dibistanê (fêrkar) derbarê vê yekê ku çi hewcetiya piştgiriya hînbûnê jibo bidestxistina armanca polê heye, nabe ku di vî warî da biryara erênî were dayîn. Ev sûd bi awayê rêkûpêk di qaliba koponê tên raberkirin an bi awayê rasterast digel raberker va tên safîkirin.

**Beşdarî di jiyana civakî û çandî**
Bi van sûdan ku qasa wê bi awayê giştî her mehê 1500 Euro ye, divê ev derfet jibo zarok û nûciwanan were dabînkirin ku di pêkhateyên civat û civakê bên sazkirin û bi taybet digel hevtemenên xwe bikevin têkiliyê.

Ev sûd dikarin jibo babetên jêrê bên bikaranîn:

- heqê endamtiyên têkildarî warên spor, lîstik, çand û danûstandina digel kesên din (wek mînak kilûba Fûtbalê),
- fêrkirin di rişteyên hunerî da (wek mînak fêrkirina Mûzîkê),
- çalakiyên rênimûnkirî yên fêrkirina çandî (wek mînak seredana mûzexaneyan),
- Beşdarî di demên betlaniyê da (wek mînak Pêşeng, dema betlaniyê jibo dîtina şanoyê).

Ev sûd bi awayê rêkûpêk di qaliba koponê tên raberkirin an bi awayê rasterast digel raberker va tên safîkirin.

**• Veguhestina xwendekaran**
Jibo mesrefên pêwîst jibo veguhestina xwendekaran bona perwerdehiya di nêziktirîn dibistana heyama perwerdehiyê ya bijartî ku ji aliyê qebûlkerên din ên mesrefê va (wek mînak li gorî qanûna dibistaana parêzgehî ya Nîdêrzaksên (Niedersächsischen) jibo payeya navîn a yekm) nayên qebûlkirin, hin sûd tên raberkirin.

**• Pakêta bingeh a dibistanê**

Pakêta bingeh a dibistanê misoger dike ku xwendekar bi pêwîstiyên guncan di perwerdehiyê da beşdar dibin. Dabînkirina mesrefa kirrînên mîna Tûrika dibistanê, lênivîsk, makîneya hesaba berîkê û alavên din bi rêya Pakêta bingeh a dibistanê va pêkan e.
Dêbav di roja 1ê Tebaxê (destpêka sala perwerdehiyê) 100,00 Euro û di
Roja 1ê Sibata sala din da 50,00 Euro werdigirin.